

Ji Penûsê Jinê Rastîya Jîyanê

RAPERÎN

Dîrok: Mijdar 2024 Hejmar: 14 Biha: 1000

BERXWEDANA JINAN WÊ

ŞER Ü DAGIRKERÎYÊ

TÊK BIBE



ROJEV

2

Em li Dijî Şer û Dagirk-
erîyê Berxwedana Jinê
Pêş Bixin

NEZERÎ

3

Di Destê me da Sîleh,
Em li Her Dera Cîhanê ne

DOSYE

6

Tespitkirin û Tedawîya
Nexweşîya Pencêşêra
Pêşîrê

EM LI DIJÎ ŞER Ü DAGIRKERÎYÊ BERXWEDANA JINÊ PÊŞ BIXIN



Li tevahîya cîhanê pêvajoya hilberîna kapîtalîst ji alîyekî ve dewlemendîyeka gelekî mezin, ji alîyê din ve jî feqîrtîyeka gelekî mezin diafirîne. Di cîhanê da li alîyekî kefek mirov di nav kîf û xweşîyê da dijî, bi mîyonan mirov jî, ji ava paqîj û nan bêpar in. Di alîyekî da birçitî û feqîrtî mezin dibe, li alîyê din dewlemendîya kefek kesen kedxwar zêde dibe.

Ên emperyalîst ji bo ku karibin hîna zêdetir xurt bibin û kedxwarî bikin bi hev ra di nav reqabetaka mezin da ne. Li alîyekî reqabeta di navbera Dewletên Yekbûyîyên Emerîka (DYE) Yekîtiya Ewropa (YE) li alîyê din reqabeta di navbera Rûsyâ û Sînê da her ku diçe tund dibe.

Rojhilata Navîn tam di orteya reqabeta emperyalîst da ye. Parvekirina di nava emperyalîstan da li Rojhilata Navîn ketîye rewşeka şerê germ. Hemleya Îsraîlê ya di bin dagirkirîye da girtina Filistînê û dorpêckirina Îranê nîşaneyî şenber a vî şerê ye. Li ser sînorê Başûrê Lubnanê êrîşen hewayî û erdî bênavber berdewam dikan. Dewleta Tirk a mêtîngehkar faşîst li dijî Rojava û Başûrê Kurdistanê êrîşeka hevşewe ya êrîşen dewleta Îsraîlê ya sîyonîst pêk tîne. Mirovatî rastî tevkîjîyeka mezin tê.

Dengê şerê cîhanê yê sîyemîn ku di heman demê da xeterîya şerê nûkleerî jî bi xwe ra tîne, hîna xurttir tê bihîstin. Amadekarîya li gorî vê ya emperyalîstan jî her ku diçe zêde dibe. Şerê Rûsyâ û Ükraynayê ku dê sê salêñ xwe temam bike, ji alîyekî ve şerî Îsraîl û Filistînê ku bi operasyona Tofana Eqşayê

derketîye asteka nû, weke alîyê din derdikeve pêş.

Îsraîla Sîyonîst şerê xwe yê jenosidê yê arresteyî gelên Filistînê; ber bi Lubnan, Yemen û Surîye ve berfireh dike. Ev di heman demê da weke pêvajoya pêşîni ya şerê emperyalîzma DYAyê ya li dijî Îranê tê jiyîn. Pêvajoya ku meydarîya pêşketina weke şerê herêmî yê Rojhilata Navîn jî dihewîne bi destê DYE/YE, bi reya dewleta Îsraîl a Dagirkir tê pêkanîn. Îsraîl û Tîrkîye weke aktorên şerê li Rojhilata Navîn, weke rîexistinê sûc li sehayê li dijî jinan û gelên bindest jenosid pêk tînin.

Berpîrsîyarê vê kedxwarî, şer û zilmê dewletên kapîtalîst ên serdest ên mîr in. Tişte ku ev desthilatdarî dibexşînin mirovatîyê şer, rûxan û bêwelat hiştin e, feqîrtîyeka kûr e, mehkûmkirina nexweşî û mirinê ye, birêkûpêkkirina tundî û zexta mîr e.

Di seranserî cîhanê da çîna karkeran, gelên bindest, jin û LGBT+ mafêñ demokratîk, edalet û azadî dixwazin. Ji ber vê jî li dijî şeran, dagirkirîyan, faşîzmê, mêtîngehkarîyê û li dijî tundiya dewlet û mîr berxwedanê mezin dikan.

Dewleta Tirk a mêtîngehkar bi deh salan e; bi xwesteka mêtîngehkarîn, talankirin û tesfiyekirina hêzên wê yên leşgerî bi operasyonê leşgerî û dagirkirîyê şerê xwe berdewam dike. Li Iraq û Sûriye hewl dide ku bi reya şer û dagirkirîyê bigêhêje armanca xwe. Li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriye bi siyaseta xwe ya dijminatî ya li dijî Rêveberîya Xweser,

dema ku pêwîst dike bi piştgirî standina ji NATO-DYE, dema pêwîst dike bi piştgirî standina ji emperyalîzma Rûsyayê hewl dide ku qadêñ xwe yên dagirkirî û ilheqê berfireh bike.

Cewhera nîqaşen li ser têkîlîyen dîplomatîk ên ku dewleta burjuva ya Tîrk dixwaze bi rejîma Esad ra li Şamê pêş bixe; fetisandina şoreşa Rojava, qetikirin û radestgirtina kadroyen wê yên pêşeng û rîber, bi embargoya siyasi û aborî dorpêckirina bajarêñ Rojava û dema ku derfet bibîne jî bi şerê dagirkir bidestxistina wê ye.

Em Li Dijî Èrîşen Dorpêckirina Şoreşê Berxwedan Bilind Bikin

Em weke jinê bindest, 25ê Mîjdara 2024an roja têkoşîna navneteweyî ya li dijî tundiya li ser jinê, di pêvajoyeka ku ligel berxwedanê li dijî şerên dagirkir û emperyalîst, berxwedanê li dijî tundiya dewlet û mîr ku mezin dibe da pêşwazî dikan. Jinê Komünîst ên Şoreşger (JKŞ) vê pêvajoyê bi hemleyeka siyasi ya nû ya bi dirûşmeya "Em li dijî şer û dagirkirîyê berxwedana jinê pêş bixin" pêşwazî dikan.

Jinan bi şoreşa Rojava ra dîrok nîvîsandin. Bi hevpeymana civakîyaku alîgirê jinê ye, be pergala hevserokatî û modêla rîexistinbûna hevbeş di hemû sazîyên civakî û leşgerî da erkîn rîveberî û fermandarîyê girtin ser milêñ xwe.

Jin, bi tevlîbûna hemleyen leşgerî yên ku li dijî çeteyen El Nûsra û DAİŞê da di têkbirin û azadkirina axêñ me da cih girtin. Li Efrînê, Serê Kanîyê û Girê Spî di şerê li

dijî dagirkirîyê da cih girtin. Serkeftinê şoreşa Rojava yên jin bi berdêla gazîyê şer û şehîdan di dîroka cîhanê da hat nîvîsandin.

Jin, ruxmê embargoyen aborî ku şoreşê dorpêç dike, ruxmê polîtikayen koçberî û şer bûn berdewamkeren jîyaneka birûmet. Divê jin îro jî hîna zêdetir tevlî xebatên ku Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriye dimeşîne bibin û hêz bidin van xebatan. Divê jin kedkarîya xwe tenê bi malê sînordar nekin, bi awayekî hîna xurt tevlî çaresarkirina pirsgêrêkên civakî û aborî bibin. Divê derîyên malêñ me ji şoreşê ra vekirî bin. Divê em bi pêşengtîya jinan ciwanan û gelên xwe rîexistin bikin.

Li Dijî Dagirkirîyê Bi Rîexistin Bibe

Em li Rojhilata Navîn û Kurdistanê li dijî şerê ku berdewam dike bi berpîrsîyartîya rîexistinkirina berxwedaneka hîna xurttir ve rû bi rû ne.

Em bi JKŞ jinan bi dirûşmeyen "Bikeve Tevgerê Berxwedana Jinê Bilind Bike", "Derbasî Çalakîyê Bibe Şoreşa Jinê Biparêze" Li Dijî Dagirkirîyê Jinan di Lijneyen Berxwedana Jinê da rîexistin bikin. Ji bo ku em bi hezaran kesan li dijî şer û dagirkirîyê di refîn şoreşê da, di refîn JKŞ da rîexistin bikin em dest bi seferberîya xebata girseyan bikin. Heman weke ku li Filistîn, Filipînan, Hindîstan, Efxanîstan, Kolombiya, Belûcîstan û Îranê jin rolê berxwêdêr dilîzin emjîrolaxwe ya pêşeng xurt bikin. Heman weke ku duh li Yûgoslavya, Spanyayê û Yekîtiya Sovyetan hatîye jiyîn. Dîrokê gelek serpêhatîyên jinê ku radest nebûne, bi berxwedanê bi ser ketine berhev kirîye. Divê em jî bi hêzgirtina ji serpêhatîyên dîroka berxwedana jin a şoreşa me ya Rojava û dîroka berxwedana jinê cîhanê, xeteka ku dawî li şer û dagirkirîyê bîne bisopînîn. Em weke jin jî bo jîyaneka birûmet, azad, wekhev û bextewar û ji bo pêşeroja şoreşa xwe bangewaziya we ya rîexistinkirina raperîneca nû dikan. Şoreşa me bi we ra xurt e, lê, dê bêyî we kêm bimîne!

DI DESTÊ ME DA SÎLEH, EM LI HER DERA CÎHANÊ NE

Teva pêşketina pergala kedxwar ya serdest a mîr a kapitalîst emperyalîst, rîexistinê bindestan ên ku li dijî wê şer dikin, gerîla û artêşen wê derketin sehneya dîrokê. Li çar alîyê cîhanê li dijî kapitalîzm, emperyalîzm û dagirkerîyê dîroka lêhengên ku şer dikin nivîsandin. Di nav artêş û gerîlayên şoreşger ku ji bo jîyan, azadî û sosyalîzmê şer dikin da me weke jin bi awayekî girseyî cih girt û em bûn şervan. Ji ber ku li dijî dewletên kujer ên pergala serdestîya mîr ên kapitalîst û emperyalîst jîyan, azadî û sosyalîzm tenê bi rîya şerkirinê dikare were bi dest xistin.

Jinan gelek caran, bi çalakîyen xwe yên kolektif (hevbeş) û pêşeng îmzeya xwe avêtin vê dîroka şerê şoreşger. Mînak di parastina Yekîtiya Sovyetîn Sosyalîst da, di şerê Stalîngrad ê navdar da: di destpêka şer da, artêşa Elman a faşîst bi awayekî nişkegavî derbasî paşîya refêr Artêşa Sor bû. Di lîwaya balafirê 1077emîn da komek jinêni ciwan ku bi armanca parastina hewayî hatibûn bicîhkirin, di bin bomberaneka sift da beşa 16emîn a panzêran ku ber bi Stalîngradê ve diçû sekinand. Bi vî awayî pêkan bû ku Artêşa Sor ji nû ve refêr xwe girtin

û bingeha serkeftina şerê Stalîngradê pêk hat.

Dîsa di şerê cîhanê yê duyemîn da, yekeyen jin ên balafirvan bombebaran dikirin, bûn kabûsa faşîstên Elman. Jinêni ku bi şev êrîşen nişkegavî (sûprîz) dikirin, bi navê "caziyên şevê" navdar bûn. Weke jinêni Filipîn ên bêhejmar, fermandar Nîves Fernandez di şerê cîhanê yê 2emîn da li dijî dagirkerên emperyalîst ên Japon rîbertî ji gelê xwe ra kir. Nîvesê, teva koma gerîla ya ku perwerde kiribû bi bikaranîna teknîka kuştina bêdeng 200 dagirker kuşt û bi hejmareka mezin girtîyen Filipînî û koleyên seksê azad kir.

Dema ku gelên Vietnamê bi parastina axên xwe emperyalîzma Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê (DYE) û Fransîs têk birin, jinêni Vietnamî bi awayekî girseyî di hemû qadêن şer da û di hemû astêن fermandarîyê da cih girtin. Mînak Nguyen Thî Dînh yek ji fermandarên herî payebilind ên hêzên leşgerî yên şoreşger bû û di pêkanîna stratejîya hêzên gerîla da roleka bingehîn lîst. Jinêni ku ji %40 hêza parastina şoreşger a Vietnamâ Başûr pêk dianîn, di heman demê da xwedî hêza xwe ya leşgerî ya ku

weke "artêşa por dirêj" hatibû binavkirin bûn.

Monîka Ertl weke jina ku tola Che Guevara rakir ket dîroka şoreşê. Roberto Quintaniya Pereirayê ku yek ji kujerên Che Guevara bû li konsolosxaneya (balyozxane) Bolîvyayê ya ku li Elmayayê bû girt, bi sê guleyan ew kuşt û bi nehiştina tu şopan ji cihê bûyerê derket.

Leyla Xalîd bû sembola têkoşîna azadîyê ya ku Filistînî li dijî dagirkerên sîyonîst dimeşîne. Bi awayekî serkeftî balafireka navneteweyî revand. Hedefê çalakîyê balyozê Israîla Sîyonîst ê Emerîkayê bû, lê ew bi awayekî tesaduf ne di balafirê da bû. Lê ev bû çalakîyeka serkeftî ku Têkoşîna Azadîyê ya Filistînê ji nû ve xist rojeva hemû cîhanê. Li Îranê, di serhildanê çekdarî yên ku li dijî Rejîma Melelî ya Faşîst hatine meşandin da, jinêni ji gelên cuda di refêr herî pêş da şer kirin, rîbertîya berxwedanê kirin û bûn xwedî hêza xwe ya leşgerî.

Ji destpêka 2011an pê ve me weke jinêni Kurdistanî yên ku çeteyen DAİŞê têkbirin, hebûna jinêni şoreşger ên birûmet ku şer dikin di dîroka cîhanê da nivîsand. Arîn Mîrkan bû fişenga nîşanê

ya ku ketina destê DAİŞê ya girê Mîştenûrê ku sengereka stratejîk bû sekinand. Ew bû sembola têkçûna DAİŞê ya Kobanê. Barîn Kobanêya ku li dijî dagirîya Efrînê bi awayekî fidayî şer kir nayê ji bîr kirin. Bi gotina "em bimirin jî em ê ji vir dernekevin" di berxwedana Kobanê da bûyîna berbest a Sarya Özgür nayê ji bîr kirin. Avaşîn Têkoşîn Güneşa ku li Til Temirê bi awayekî lêheng şer kir bû sembola xuştîya gelan. Aynur Ada û Ceren Güneş ji Tirkîye hatin û ji bo parastina şoreşa Rojava bi awayekî fidayî şer kirin. Û bi vî awayî weke mensûbêni ji gelên serdest, bûn sembolên mildayîna gelên bindest.

Weke Rêxistina Jinêni Komunîst (RJK-KKO) em li ku derê bin, li dijî dewletên serdest ên mîr ên emperyalîst û faşîst, li dijî artêş û çeteyen wan şer dikin. Weke ku di şoreşen antîmîtingehkar, antîemperyalîst, antîkapitalîst, antîfaşîst da, şoreşa jin jî encax bi amûrêni zorê dikare were bi dest xistin. Ji ber vê yekê em ji bo mezinbûna şoreşen nû, hêzên jin ên leşgerî yên ku karibin şoreşan qezenc bikin amade dikin. Em bi vî awayî ewlehîya ku sedsala 21emîn sedsala şoreşen jinê ye teqez dikin.



PERPERIK LI HER DERÊ NE


PATRİA



MÎNERVA



MARİA



25ê Mijdarê roja têkoşîna li dijî tundîya li ser jinê. Ev roj, roja ku li hemû cîhanê jin li dijî tundîya mîr derdikeve kolanan e. Jin vê rojê tenê li dijî tundîya mîr dernakevin kolanan. Di heman demê da li dijî politikayê ku dewletên mîtingehkar faşist pêk tînin jî çalakîyan pêk tînin. Ev roj di heman demê da roja serhildana jinan a li dijî şerênu ku dewletên emperyalîst derdixe ye. Ev roj di heman demê da roja serhildana ji bo azadîya axêni bin dagirkeriyê da ye. Wateya 25ê Mijdarê ji bo jinan mezin e. Ji bo ku em girîngîya vê ya di têkoşîna azadîya jinê da nas bikin werin em jîyana Xûşkêñ Mîrabel nas bikin.

Sê xûşkêñ ku weke Xûşkêñ Mîrabel ketin dîrokê, sê jinê şoreşger ên ku li Komara Domînîkê jîyîn e. Navê wan Patria, Mînerva û Marîa bû. Li welatê wan ê bi navê Domînîk dîktatorîyeka ku bi salan dirêj kir hebû. Di sala 1930an da Rafael Leonîdas Trûjîlo bi derbeyeka leşgerî desthilatdarîya Domînîkê bi dest xist û 31 salan bi piştgirîya Emerîka û burjuazîya xwe Komara Domînîkê bi dîktatorîyê bi rê ve bir. Di dirêjahîya 31 salan da şoreşgerên bêhejmar qetil kir. Her kesê ku li dijî wî bû di zindanan da, di şkenceyêngiran ra derbas kir. Hemû jinê Domînîkê wekî milkê xwe dit. Zor li jinan kir ki bi zorê xizmetî wî û leşgerên wî bikin. Di sala 1937an da nêzîkî 30 hezar welatîyen Haîtî bi rîya kursîyen kehrebe qetil kir. Sedema vê komkujiyê ew ku gelê Haîtî nikarîbûn ku tîpa 'r' bibêje. Trûjîlo xwedîyê %80 axêni Domînîkê bû. Piranîya gel li cem wî bi heqê ziktîriyê dixebitîyan. Li Komara Domînîkê hilberana şekir pêşketî bû. Li Domînîkê ji %65 hilberana şekir eydî malbata Trûjîlo bû. Di wê heyamê da kesen ku piştgirî didan Trûjîlo dirûşmeya "Di Bihûstê da Xwedê, Li Cîhanê Trûjîlo" diavêtin.

Li Dijî Trûjîlo Şerê Xûşkêñ Mîrabel

Xûşkêñ Mîrabel di malbateka perwerdekirî da mezin bûn. Mînerva bi fîkrênu xwe yên şoreşgerî derdiket pêş. Ji bo ku bibe parêzer

xwend, lê ji bo ku ew şoreşger bû dihat astengkirin. Ji ber vê yekê hêrsê Mînervayê yê li dijî dîktatorîyê mezintir bû. Mînervayê bi hişmendî û xweşikîya xwe bala Trûjîlo kişandibû ser xwe. Di wê heyamê da Trûjîlo zor li jinan dikir ku wan di şahîyan da bîne cem hev. Di van şahîyan da jin rastî tacîz û tecawîza leşgerên Trûjîlo dihatin. Jinênu ku ruxmê ku hatine vexwandin û tevlîvan şahîyan nedibûn bi derxistina serhildanê dihatin sûcdarkirin û dihatin xistin hepsê. Di sala 1960an da sê xûşkêñ Mîrabel jî hatin vexwandin şahîyeka ku Trûjîlo lidar dixist. Xûşkêñ Mîrabel û malbata xwe mecbûr man ku tevlî vê şahîyê bibin. Di vê partîyê da geleki jin rastî tacîzê dihatin. Trûjîlo berê xwe da Mînervayê û ew rakir dansê. Trûjîlo dema ku dans dikirin Mînerva tacîz kir. Mînerva wekî jinê din li dijî tacîzê bêdeng nema. Kesê ku li dijî wê çiqasî dîktatorekî xurt be jî ji bo sekinandina tacîzê ew netirsî û li wî xist. Piştî vê Trûjîlo bi hemû hêrsê xwe êrîşa xûşkêñ Mîrabel û malbata wan kir. Destpêkê bavê hate girtin, piştre dayika wan hate revandin. Hemû endamên malbatê zext û şkence dîtin û gefa mirinê li wan hate xwarin.

Li Domînîkê dem bi dem serhildan û tevgerên bi daxwaza azadîyê çedibûn. Xûşkêñ Mîrabel jî di rêxistina 14ê Hezîranê ya ku li dijî Trûjîlo rêxistineka ilegal bû da rêxistin bûn. Piştre tevgereka bi navê Clandestîna-Tevgera Guherîna Civakî avakirin. Vê tevgerê serkeftineka mezin bi dest xist û belavî hemû welêt bû. Muwazif û zarokên piştevanen rejîmê jî di nav da piştgirîya geleki ciwanan girt. Ji bûyerên şoreşger ên li Kubayê

bandor bûn. Mînerva, xûşka wê ya bicûk Marîa û hevînê wê ji navêngirîng ên rêxistinê bûn. Xûşka din Patriyê jî alîkarîya wan dikir. Xûşkêñ Mîrabel ji alîyê Trûjîlo ve gelek caran hatin xistin hepsê. Ji pê ve dest hat danîn ser hemû milkê wan. Trûjîlo Xûşkêñ Mîrabel ji xwe ra weke gef didît û ev yek aşkere dianî ser ziman. Di axaftineka xwe ya li pêşîya gel digot "Pirsgêrêka welat a herî mezin kenise û xûşkêñ Mîrabel in" Bi vî awayî Xûşkêñ Mîrabel weke xayinêng welat ûlan dikir û bi awayekî vekirî ji bo qetilkirina Xûşkêñ Mîrabel talîmat dida piştevanen xwe. Ew bi dehan caran ketin hepsê, lê gel pir ji wan hez dikir.

Trûjîlo hevînê Xûşkêñ Mîrabel ên ku di hepsê da şand hepsa herî dûrî peytaxtê. Ev cih cihekî ku di navberê da çiyayek hebû bû. Xûşkêñ Mîrabel dizanîn ku ev kemînek e, lê ruxmê vê guh nedan hişyarîyen dosten xwe ji bo ku hevînêng xwe bibînin ketin rê.

Di 25ê Mijdara 1960an da di rîya vegerê da erebeya ku ew tê da bûn jî alîyê leşgerên Trûjîlo ve hate xistin kemînê. Sê xûşkêñ û şoforêng wan bi rîya lêdan û fetisandinê hatin qetilkirin. Ji pê ve Xûşkêñ Mîrabel berî ku bêng qetilkirin rastî tecawîzê hatin. Dema ku hatin qetilkirin Patria 36, Mînerva 34, Marîa Teresa jî 24 salî bû.

Li ser mirina Xûşkêñ Mîrabel li Domînîkê raperîn zêde bûn. Emerîka piştgirîya xwe vekişand. Piştî demekê, di 30ê Gulana 1961an da Trûjîlo ji alîyê leşgerên xwe ve hate kuştin. Di Sibata 1963an da Komara Domînîkê bi awayekî demokratîk, bi bikaranîna dengan hikûmet

hate hilbijartîn.

Di sala 1981an da di yekemîn komcivîna Jinê Karayîb û Emerîkaya Latînî ku li Bogotoya ku peytaxta Kolombiyayê kom bibû da 25ê Mijdarê weke "roja Piştgirîya Navneteweyî û Têkoşîna Tundîya Li Dijî Jinê" hate qebûlkirin. Li dijî ev bûyerên ku bandor li hemû cîhanê kir Neteweyen Yekbûyî di 17ê Berfanbera sala 1999an da 25ê Mijdarê "roja navneteweyî ya têkoşînê ya ji bo rakirina ji holê ya tundîya li ser jinê" ûlan kir. Ji wê rojê pê ve û irojin di vê rojê da li dijî tundî, şer û dagirkeriyê derdikevin kolanan.

Perperik Li Her Derê ne

Duh Trûjîlo iro Tramp, Netanyahû an jî Erdoxan. Navêngirîng dîktatoran guherîn lê polîtikayêng idijîjinênguherîn. Trûjîlo çîma hêrsekî ew qasî mezin li dijî Xûşkêñ Mîrabel dibîhîst. Ji ber ku Xûşkêñ Mîrabel nûnertîya jinêng ku dipirsîn û serî radikirin dikirin. Hemû gel û gelê bindest hêz ji wan digirt. Ew nebûn koleyên dîktatorîyê û li dijî tacîzê bêtirs deng derxistin, bersiv dan. Iro dagirkerî û mîtingehkarî li her derê ye. Em ê weke jin dê li dijî êrîşen dagirkeriyê bisekinin. Li dijî êrîşen İsraîla Siyonîst ên li ser Filistîn û Lubnanê, dê em ê weke jin bisekinin. Dê em ê weke jin zexta rejîma Melelî yên li ser jinê ji hemû cîhanê ra qîr bikin û azadîyê dê em ê weke jin bînin. Li dijî dagirkerî, şer û her cure tundîyê weke di dîrokêda iro jîdê jin pêşengtiyê bikin. Xûşkêñ Mîrabel bi navê perperik dihatin naskirin. Perperik iro li her derê bi dirûşmeya "Jin Jîyan Azadî" baskêng xwe vedidin.

BERXWE BIDE, XWE BIPARÊZ E

Di vê têkoşînê da serdestîya mér bi şêweyên cuda derdikeve pêşberî me. Şerê di navbera zayandan da her ku diçe kûr dibe. Dewletên Mêtingehkar, li axênu ku dagir dikin û li dewletênu mêtîngeh dikin polîtikayênu serdestîya mér hîna kûrtir bikin pêş dixin. Li ser axênu Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriye têkoşîna li dijî çanda eşîrtî û jîyana kevin ku vîna jinê tune dihesibîne berdewam dike. Di vê têkoşînê da dijminê şoreşê bi rêbazêne gelekî cuda êrîş dikin. Em ê hinekan ji van di mijara xwe ya dosyeya têkoşîna jinê da bigirin dest.

Li Rojava şoreş pêk hat, lê jin hîna li dijî tundîya mér têdikoşin. Di jîyana jinan da tundîya fizikî, derûnî, aborî û cinsî heye. Baş e, dê jin li dijî tundîyê xwe çawa biparêzin? Ger em ji bira, bav an jî hevjinê xwe lêdan dixwin em ê çi bikin? Ger ku evîndarê (hezkirî) me, hevalê me an jî mîrekî ku em nas dikin gefa li me dixwe em ê çi bikin?

Em ê Di Kêlîya Tundîyê Fizîkî da Çi Bikin?

Ger ku hevjin, bav û bira an jî ji mîrekî din li dijî we tundî bi kar tîne yekem tiştê ku hûn bikin parastina xwe ye. Di kêlîya tundîyê da yekem tiştê ku hûn bikin bi zirara herî kêm dûrketa jî wir e. Şerm nekin, qîr bikin alîkarî bixwazin. Gelek jin ji vê şerm dikin. Lî lêdan xwerin ne eyba we ye. Ger ku hûn ducanî bin hewl bidin ku hûn di zik, an jî pişa xwe da derb nexwin. Bi destê

xwe serîyê xwe biparêzin. Ger ku bi amûrekî bira yên wekî kîr, meqes êrîş dike bi tiştêkî wekî balgî xwe biparêzin. Ger ku bûyera tundîyê di hundirê malê da tê jiyîn hewldana yekser derketina derive bidin. Ger ku ev ne gengaz be, birevin hundirê odayeka cuda û ewlehîya xwe misoger bikin û li benda derbasbûna xetereyê bin. Ger ku li malê bûyera tundîyê her tim berdewam be teqezi amûrên wekî meqes, kîr, kebil û hwd. ji holê rakin û veşerin. Qasî ku ji destê we bê hewl bidin û bi ew kesî ku li hemberî we tundî bi kar tîne ve tenê nemînin.

Bersiv Bidin!

Di avanîya eşîr û civaka kevnare da tundîya li ser jinê xwezayî tê hesibandin. Jin hîna ji zaroktîya xwe da biêteatkirina mér mezin dibin. Jinênu ku berî zewacê ji bav an jî birayê xwe tundî dibînin, pişti zewacê ji hevjin û zarokên xwe, an jî xizmîn (eqrebe) hevjinê xwe tundî dibînin. Bersivdayîna we ya li dijî tundîyê mafa we ya herî xwezayî ye. Ji ber vê yekê, di kêlîya tundîyê da ji bo parastina xwe xweparastin bikin û bersiv bidin. Ev ne guneh û eyb e. Bi şêweya 'loman ji min dike, ez rezîl dibim, malbata min, min qebûl nake' nefikirin. Pêwîst e em destpêkê vê qebûl bikin. Dema ku em rastî tundîyê tê qirkirin, dehfdan, gezkirin, ji bo xweparastinê yekem tiştênu ku em bikin in. Li jêr me hin gavênu ku em li dijî tundîyê bavêjin me bi rêya sûretan vegot.

Li Dijî Gefan Serî Netewînin!

Dewleta Tirk a mêtîngehkar ku hewl dide şoreşa Rojava hilweşîne li ser jinan polîtikayê qirêj dide meşandin. Hewl dide ku bi rêya şebekeyen sixûr û hevkaran şoreşê hilweşîne. Ji bo ku karibe jinan ji bo dijminatîya şoreşê qanah bike rêya tehdîtan bi kar tîne. Ji ber vê yekê divê em hemû jinênu ku li ser axênu şoreşê dijîn, li dijî van êrîsan şîyar bibin. Bi taybetî di ev heyamên dawî da bernameyen sohpetê yên ku li ser telefonen lems hatine vekirin geleki xeternak in. Ev bernâme wekî bêzirar xuya dikin. Di ev bernameyen sohbetên hevbeş da, armanca esasî ji bo dijminatîya şoreşê xistina kemînê ya jinan e. Derheqê van bernameyan da, dê beşa berfireh di dosyeya me ya demêne pêş me da hebin. Jinênu ku di bernameyen sohbetê yên li ser Instagram, qanaten whatsapp û facebookê têxapandin hene. Ev jin ji belavbûna sûretên xwe yên xas ditirsin. Ji ber vê yekê jinênu ku li dijî van gefan serî ditewînin hene. Hin jin tenê ji ber vê sedemê ber bi întîharê (xwe kuştin) ve hatin kişandin. Wê demê pêwîst e ku em çi bikin?

Bi mirovên ku hûn nas nakin ra li ser telefon, facebook, instagram an jî bernâme û qanaten cuda nebin heval. Numreyen ku ji Tirkîye an jî dewleteka din ku dixwaze bi we ra biaxivin

qebûl nekin. Sûretên xwe yên taybet ji kesî ra neşînin. Bi kesen ku hûn nas nakin ra bidîmen neaxivin. Ger yek we bi sûretên bêexlaq gefan li we bixwe hemû mesajen wî/wê qeyd bikin. Numre telefonê qeyd bikin û ger gengaz bibe sûretê wî/wê veşerin. Tu carî bi wan kesan ra neçin hevditînê û bi gotin an jî daxwazên wan tev negerin. Piştî ku ahahîyên derheqê wî da qeyd bikin, reqamên asteng bikin û hema di cî da serî li asayış û asayışa jin bidin.

Sazîyên Şoreşê Ji bo Parastina we Hene!

Di şoreşa me da gelek sazîyên jinê hene. Ev sazî ji bo parastina jinênu ku rastî tundî an jî gefxwarinan têhene. Asayışa jin, Mala Jin, Weqfa Sara, YPJê û em jinênu Komunîstên Şoreşger (JKŞ) ji bo parastina jinan di her kîlîye da amade ne. Ger ku hûn rastî tundî an jî gefxwarinan têhene serî li van sazîyan bidin.

Li Rojava hîna avanîya eşîrtî mewcûd e. Gelek jin bi awayî 'ger ez biçim sazîyên şoreşê malbata min dibîhize, ez rezîl dibim' difikirin. Hûn netirsin. Li sazîyên jinan dosyeyen van dozan veşartî ne. Heta ku hûn nexwezin kes nikare mijara dozê aşkere bike. Sazîyên jinê ji bo karibin jinan ji eşîr û zagonen wê biparêzin geleki hesas in. Gelek jin alîkarî ji sazîyan dixwazin û bi vî awayî ji gefan rizgar dibin. Hûn jî netirsin û tu carî li dijî gefan serî netewînin.



**1 NETIRSE
WÎ HIŞYAR BIKE**



**2 QİR BIKE
ALÎKARIYÊ
BIXWAZE**



**3 DEHF BIKE
WÎ JI XWE DÛR
BIXE**



**4 BERSIV BIDE
LI BER XWE BIDE
LEXE
XWE BIPARÊZ E**

TESPİTKIRIN Û TEDAWÎYA NEXWEŞÎYA PENCÊŞERA PÊSÎRÊ

Penceşera pêşîrê yek ji cureyên penceşêrê ya herî berbelav û ji %25 bandorê li jinan dike. Mîna cureyên din ên penceşêrê, ew ji ber têkilîyeka di navbera faktoreka hawirdorê ya derveyî û hestîyarîya genetîkî da çêdibe. Şaneyên normal bi qasî ku hewce dike dabeş dibin û piştre dabeşbûna xwe disezinînin. Piştre bi şaneyên din ve têr girêdan û di navtevnê da di cih da dimînin.

Şane dema ku şiyana xwe ya ku dabeşbûna xwe rawestînin winda bikin, bi şaneyên din ve werin girêdan, li cihê xwe bimînin û di wextê rast da bimirin dibin penceşêr. Şaneyên normal dema ku êdî hewce nebin xwe dikujin. Heta wê demê, şaneyên normal bi çend rîyan ji xwekuştinê têne parastin û komên proteîn. Carinan genên girêdayî rîyên parastinê dikevin ber mutasyonên genetîkî yên wiha ku ev rî bi domdarî çalak dibin. Û bi vî rengî şaneyek dema ku êdî hewce nebe nikare xwe bikuje. Ev yek li gel mutasyonên genetîkî yên din dibe yek ji gava sedema penceşêrê. Berevajî tiştên ku hin kes difikirin, penceşera

pêşîrê tenê bi jinan re sînordar nabe, ew li mîran jî bandor dike, lê rîjeya wê di mîran da di navbera 0,5 û 1% da ye. 99% ji bûyeran bandorê li jinan dike. Ji ber ku tîmor deh qat zêdetirî mîran bandorê li jinan dike.

Pir cureyên peneşera pêşîrê bi analîza mîkroskopî ya nimûneyek an biopsiya ku ji devera bandorkirî ya pêşîrê hatîye girtin bi hêsanî têr teşîskirin. Lê belê, cureyên kêm ên penceşera pêşîrê hene ku hewcedarîya wan bi rîbazên laboratîf ên pispor hene. Du rîbazên muayeneyê yên ku herîzede têne bikaranîn ev in: Muayeneya laşî ya pêşîrê û ya duyemîn bi rîya mamografiyê. Ev her du rîbaz dikarin bi ixtimaleka teqez dîyar bikin ka girse penceşêrê ye an na kîstek hêsan e. Dema ku ev ceribandin nebawer in, peydakerê lênihêrîna tenduristî dikare ji bo analîza mîkroskopî nimûneyekê ji şilava di girseyê de bigire. (Ev pêvajo wek biopsiya aspirasyonê ya derziyê tê zanîn) ku ji bo piştrastkirina tespîtê bibe alîkar. Ger hewce bibe, ev pêvajo li ofîsa lênihêrîna tenduristiyê bi

karanîna anesthesiya herêmî tê kirin. Ger şilav zelal be, pir ne pêkan e ku girseyâ penceşêrê be. Lê belê, heke di şilavê da xwîn hebe, nimûne ji bo lêkolînkirina di bin mîkroskopê da tê şandin da ku bê dîtin şaneyên penceşêrê hene yan jî nîne.


Sê rîbazên wekî muayeneya laşî, radyografi û biopsî yên ku têr bikaranîn di tespîtkirin penceşera pêşîrê da encamên pir rast derdixîne. Ji bo teşîsa penceşera pêşîrê vebijarkên din jî hene. Biopsiya pêşîrê ji bo teşîsê: biopsiya kolostrum, biyopsiya pêşîrê ya bi alîkarîya aspiratorê ku tê da beşek ji girseyâ pêşîrê tê rakirin, an biopsîyek berfireh; Cihê ku tevahiya girseyê ji pêşîrê tê derxistin. Pir caran encamên muayeneya laşî ji hêla lênihêrîna tenduristiyê ve, bikaranîna mammogram (mammogram), û ceribandinê din ên ku di rewşen taybetî da têne kirin. (Mînak ultrasoun an MRI) ji bo misogerkirina biopsîyeka berfireh wekî teşîsek teqez û dermankirina destpêkê ya penceşera pêşîrê bes in .

Pênaseya mamografiyê (mammogram):

Ji bo wênekirina sîngê tîrêjên X tê bikaranîn.

Ew dikarin ji bo tespîtkirina penceşera pêşîrê an jî ji bo mebestên teşîskirinê, wek kontrolkirina nîşanan an encamên neasayı li ser ceribandineka wênekêsiyek din werin bikaranîn. Dema ku mamografi tê kirin, memik di navbera du rûxên hiş da têne pêçandin da ku tevna pêşîrê dirêj bike. Piştre rontgenên wêneyên reş û spî yên ku li ser ekrama komputerê xuya dikin û ji bo nîşanên penceşêrê têne şopandin digire. Mamografi di tesbîtkirina penceşera pêşîrê da roleka girîng dilîze, ji ber ku ew dikarin penceşera pêşîrê berî ku nîşan û nîşaneyên wê xuya bibin tespît bikin.

Cûreyek nûya mamografiyê heye ku bi navê mammografa 3D (CT mamografi) tê zanîn. Ev wêneyên sê-alî yên pêşîrê çêdike. Ew armanc dike ku şaneyên penceşêrê û guhertinê din ên di tevna pêşîrê da tespît bike. Di heman demê da ji bo ceribandin an armancê tespîtkirinê jî tê bikar anîn.





KİJAN AZADÎ ?

Çi xweş e mirov azad be, li gorî kêfa xwe tevbigere. Bi hevalên xwe ra derkeve, bigere. Bi hevalên xort ra biçin kafêteriyakê, cilêن li gorî kêfa xwe li xwe bike. Makyaja xwe li gorî kêfa xwe bike. Heta saetên dereng ên şevê li kolanan bimîne. Li gorî kêfa xwe pere xerc bike, her tiştê ku bixwaze bikire û bike. Çi xweş e mirov bi hezkirîyê xwe ve li parkekê dest bi dest bigere. Ma dê çi bibe ku em jî hinek li kolanan qîr bikin, bêhna xwe derxin. Ka ez ê jî porê xwe li kolanan vekim û cilêن xweşik û vekirî li xwe bikim, li ser kêfa xwe cixare û nêrgîle vexwim. Ma ev qas azadî ji min ra zêde ye?

Hevalên min her tim li cem kuaforan neynûkêن xwe çêdikin, porê xwe reng bi reng dikin, bi hevalên xwe ra şîva xwe li xwaringehêن herî mezin dixwin. Keça cîranan rojbûna xwe li mesbehê çêkir. Ez nizanim ka ev hevala min ya çenda ye ku zewicî û derket Ewropa, ez çi ji xwe ra bêjim? min 18ê salîya xwe derbas kir û ez hîna li mal mame... Min li ku xwendibû nizanim digot ku 'azadî, çi dixwazî bike tu serbestî, heta ku tu bigêhêje sînorên miroveka-mirovekê dîtir'. Ma piçek ji van azadîyan nabe para min jî?

Gelo bi rastî ew azad in? mînak ew ên ku her dem digerin û derdikevin ji çi baz didin, gelo ew azad in da ku karibin li ser jiyana xwe birtyarekê bidin? dikarin ji tora malbata xwe derkevin? Dikarin dema xwe bi xwe bi rê ve bibin? dikarin ji bo xwe û pêşketina xwe tiştêk bikin? dikarin pêşerojeka baş ava bikin? Hevalên min ên ku 14-15 salî ne ji bo ku malbatê xwe derxînin Ewropa zewicîn. Ew çawa azad in? an bûn qurbanêن bav û birayê xwe! Mesela bi rastî ew azad in ku xeyalan ava bikin û bibin parçeyek ji xeyala jîyaneka azad, wekhev û bêkexwarî...

Baş e, lê azadî ci ye? gelo azadî bi rastî ev tiştênu ku me ji destpêkê ve behsa wan kirine? Em pir baş dizanin ku wek her têgjhekê, ji têgiha azadîyêjî her kes tiştêkê cuda fêhm dike. Ên dewlemend ku di asta burjuva da ne, heta ku bi takekesiya xwe tevdigerin, serbest in ku her tiştê bikin. Ji bo wan ne eyb û exlaq heye, ne jî bêderfetî. Dikarin biçin her derê, dikarin sînorên her welatê derbas bikin. Dikarin mirovan bikirin, bifiroşin û bikûjin. Hîna îro jî em dibînin ku sûcêن burjuvayan ên li dijî mirovahîyê dîbin rojeva nûçeyan. Mînaka herî hêsan, şerê Isaraîlê yê ku li hemberê gelê Filistîn ê li Xezayê ye. Ji ber ku dewletên emperyalîst ên rojavayî hevkarên wê ne. Ew di hemû sûcêن xwe yên şer da azad e. Ev burjuvazîya ku riziyaye, wek zombîyan li ser rûyê cîhanê digere û mîjîyên mirovan dixwe.

Azadîya xwe ya takekesî dike mînak û ezeztîyê ferzî civakê dike. Bandora wê li ser gelê me bi taybet jî weke jinên ciwan li ser me çawa derdikeve holê? Wek ku me li jor mînakên wê dan, azadîyeka burjuva, azadîyeka ezez û takekesî dike armanca jîyana me. Ji bo ku em ne parçeyek ji vê civakê bin, rizgarîyeka şexsî didin pêş me. Ji me ra dibêjin ku "nefikirin, tu tiştê nepirsin, tenê tiştênu ku em didin pêş we bigirin û azadîya xwe ji navâ van peyda bikin, xwe rizgar bikin" Ji me ra dibêjin; "hûn li azadîyê digerin, derkevin kolanan, lê bizanibin ku mîr jî li hemberî we azad in! Qasî ku bav û birayê we rê didin we hûn azad in. Em wek dewlet û wek pergala kapitalîst vê azadîyê her tim didin we. Hûn dikarin bizewicin û xwe ji malbata xwe xilas bikin, azadîya xwe ji bav û birayê xwe bistînin." Ji me ra dibêjin, "hûn li azadîyê digerin hûn dikarin kar bikin û azadîya xwe ya aborî ji mîrê xwe bistînin. Hûn li ser bedenê xwe azad in, lê li gorî

pîvanên ku em didin. Jina herî xweşik em ê pêş we bikin û hûn azad in bedenê xwe wek wê bikin, ji bo vê çi zehmetî û şkence pêwîst be hûn azad in bikişînin" û hwd.

Ew dewlemendênu ku cîhanê bi rê ve dîbin, ji bo ku karibin me bi hêsanî bikin koleyên pergala xwe; ezezî û takekesiyê di nav me da pêş dixin. Lê azadî ango rizgarîya ku didin pêş me, koletîyeka hîna girantir e. Ji ber ku me bi ev azadîya ezez dixapînin! An jî hevalên min ên ku hîna di emrekê gelekî biçûk da bûn û hîna xwe nas nedikirin ji bo xilasbûna ji dexta malbatê zewicîn. Lê ev jî ji bo wan, bû koletîyeka cuda û ciwantîya xwe dan ber mîr an.

Ez dizanim ku tiştê em ji azadîyê fêm dikin û tiştê ku yên burjuva fêhm dikin ne weke hev in. Em wek jinên ciwan bi civakîbûn û bi azadîya civakî dikarin azad bibin! Dema ku em li kolanan dimeşin, em xwe di bin dextekê da hîs nekin, em çavên herkesî li ser xwe nebînin, wa em ê wê demê azad bibin! Ev azadî jî bi şer û têkoşînê tê bîdestxistin. Heta ku em azadîya jinan bi giştî bi dest nexin, em şoreşa jin bi giştî di nava civakê da belav nekin, em nikarin azad bibin! Ji bo azadîyê, pêwîst e ku em xwe bizanin, nas bikin. Vîna xwe rêxistin bikin û ji azadîyê hêvîdar bin. Ev jî ne bi ezeztî û takekesî tenê bi rêxistinbûyînê gengaz dibe. Em çiqasî azadîya xwe û ya civakê bikin yek, em ê ewqas rehet azadîya xwe ya şexsî jî xwe bijîn. Em çiqasî mîjîyên xwe azad bikin û ji bo azadîya civakî têbikoşin, ev jîyanê jî xweştir dike. Lewma pêwîst e ez hem ji bo azadîya xwe, hem jî ji bo azadîya xûşkêن xwe asta rêxistinbûyînê hîn bilindtir bikim û bi dû azadîyeka rastî bikevîm...

ÇARE NE XWEKUŞTIN E, ÇARESARÎ ŞOREŞ E

Me weke Jinên Komunîst ên Şoreşger (JKŞ) di heyama dawî da me li Kobanê li dijî bûyerên xwekuştinê yên ku zêde bûne hemleyek destpê kir. Me di dirêjahîya vê hemleyê da bi hevrîyên xwe yên TKŞî û CKŞî ra ji bo bi dawîbûna xwekuştinan xebat meşandin. Me bi taybetî ji bo fêmkirina sedema xwekuştinan civîn çêkirin, me li navenda bajêr poster daliqandin û xebata pirsname meşand. Di vê mijarê da xebatê me berdewam dikan. Di dirêjahîya hemleyê da bi jinan ra li ser vê mijarê nîqaş meşand û me sedemên xwekujîyan lêkolîn kir.

TUNDÎ YEKEM SEDEMA XWEKUJİYAN E

Destpêkê da em bidin xuyakirin ku di mijara xwekuştinan da lêpirsîn hîna berdewam dikan. Mêrên ku di pileya yekem da mîrivên jinênu xwe dikujin têxistin berfirehîya lêpirsînê. Bavê wê, birayê wê an jî ger zewicî be hevjinê wê di vê demê da çiqasî sûçdar in tê vekolandin. Di hemû xwekujîyen jinan da bi gumana kuştinê tê tevgerîn. Yekîneyên Parastina Jin û Asayısa Jin di vê mijarê da gelek baldar dixebite. Di nav sedemên ku jinan ber bi xwekujîye ve dikişine, ya ku herî zêde derdikeve pêş tundîya mîr e. Zagonên eşîr û avanîya paşverû ya civakî, jinan dixe tengzariyê. Di dorhêla ku her rojaneyî tundî û zext berdewam dike da jin bawerîya xwe ya jî jîyanê winda dikan.

Me weke JKŞê li Kobanê gelek civînên malan çêkirin. Mijara ku jinan herî zêde anîn ser ziman tundîya mîr bû. Elbet li dijî tundîya mîr xwekujîyen jinan kîmanîyeka mezin e. Saziyêne me yên şoreşê hene, zagonên jinê hene. Me di van civînân da dît ku piranîya jinan, piranîya van zagonan nizanin. An jî bawerîya wan a guherîna hin tiştan kêm bûye. Dema ku jin rastî tundîyê tênaçin Asayısa Jin an jî Mala Jin û ji ber vê nikarin çaresarî bibînin. Ev rewş jî dihêle ku jin bikevin rîwşka bêcaretî xwe bikujin.

PİSTGİRİYA DI NAVBERA JINAN DA KÊM E

Mijareka din a ku di civînan da ketîye rojevê kîmbûna piştgirîya di navbera jinan da bû. Di navbera jinan da rewşen wekî paşgotinî (gelacî), qehirîn, çavneberî têni jiyan. Ev rewş cesareta jinênu xwe dixwazin li dijî zagonên eşîrê derkevin dişkîne. Em weke jin car caran dîbin zincîren hev û em dîbin parêzvanen zagonen kevnare yên serdestîya mîr. Bi taybetî jinênu emrê xwe mezin weke gardîyanan li pêsiya jinênu xwe dixwazin azad bîbin dîbin asteng.

Di nav jinênu ciwan da jî sedemên xwekujîyan ên ku hîna zêdetir derketîye pêş jî hevaltîyên ku li ser medyaya civakî têni avakirin û tundîya dergistîyan bû. Jinênu ciwan ên ku li ser qenalên whatsapp, facebook, medyaya civakî bi mîran ra têkîliya hezkirinê çêdikin dikevin kemîna sixûrkirinê ya dewleta Tirk a mîtingehkar. Bi sûretên xas, gef li jinênu ciwan têni xwarin. Mîr bi gotinên wekî "ger tu tiştê ku ez dixwazim nekî ez te rezîl dikim, sûretên te belav dikim" gefan li jinan dixwin. Ji ber van gefan jin, dizivirin sixûrên istixbarata dewleta Tirk a dagirker. Hinek jinênu ciwan ên ku nikarin xwe li vê zextê ragirin xwe dikujin. Me li vir dît ku jinênu ciwan naçin saziyêne şoreşê. Jinênu ciwan mafênu xwe nizanin. Bi tîrsa ku dê navê xwe pîs bibe li dijî gefen mîran serî ditewînin.

SEDEMA XWEKUJİYEN MÊRAN PIRANÎ BIKARANÎNA HİSBİR E

Rêjeya xwekujîyan hem di nav jinan da, hem jî di nav mîran da gelekî belav bû. Di nav sedemên xwekujîyen mîran da bikaranîna hişbirê sedema ku herî zêde derket pêş bû. Li gel vê lêgerînê jîyaneka burjuva jî pêkereka

ku mirovan ber bêhêvîtyê ve dikişine ye. Bikaranîna telefonan bandoreka neyînî li têkilîyên mirovan dike. Bi rîbazên şerê taybet ra rizîna civakî kûrtir dibe. Mirovan berê girîngî didan têkilîyên cîrantiyê. Dema ku piştgirî û piştgirîya civakî kêm dibe û herkes dizivire cîhana xwe. Mirovîn ku li ser telefon û intérnêtê gelekî dem derbas dîkin bîyanî hevdû dîbin, pişta xwe dizivirin bûyerên ku di cîhanê da diqewimin. Pirsgerêkên şoreşê û zehmetîyên jîyanê di çavên mirovan da gelekî mezin dîbin. Hesta bêcaretîyê, bitenêbûn, bêçareserîbûn di nav sedemên xwekujîyan da ye.

